# KERA BOZ
## Jiyana Min ya Dijwar

**HÛTÎ ASLAN**

**KERA BOZ -Jiyana Min ya Dijwar**
**Nivîskar:** Hûtî Aslan

**Weşanxaneya Azad**
**Çîrok:** 11/26

**Gerînendeya Weşanê:** Eslîxan YILDIRIM

**Wêneyên Pirtûkê:** Zeyneb YEŞÎLMEN

**Sererastkirin:** Eslîxan YILDIRIM

**Berg & Rûpelsazî:** Dawud Rêbiwar

**Çapa Yekemîn:** Weşanên Azad, 2026

**ISBN:** 978-625-99331-5-3

**Çapxane:**
Bizim Büro Basım Evi Yayın ve
Dağıtım Hizmetleri Sanayi ve Tic. Ltd. Şti.
Zübeyde Hanım Mah. Sedef Cad. No: 6/A
Altındağ/Ankara
**Sertifika No:** 42488

**Navnîşan:**
AZAD YAYINEVİ
Viranşehir Mah. 34330 Sk. No: 15 A/4
Mezitli/Mersin
**Sertifika No:** 40407

**WEB:** www.wesanxaneyaazad.net

© ***Mafê wê parastî ye. Ji bilî danasînê bêyî destûr bi tu awayî nayê kopîkirin û nayê belavkirin.***

# KERA BOZ


## Jiyana Min ya Dijwar



**HÛTÎ ASLAN**

AZAD

**HÛTÎ ASLAN:** Hûtî Aslan di sala 1945an de li gundê Hatxê ya ku niha bi navçeya Nisêbînê ve girêdayî ye hatîye dinyê. Di zarokîya xwe de heya pênc salî li gund maye. Weke zarokên gunda çi kar hebe kirîye. Dibistana seretayî û ya navîn li Nisêbînê, xwendegeha ji bo huner jî li bajarê Edirne (bajarekî Tirkîye ku li ser sînorê Bulgarîa cîh girtîye) xwendîye.



Ji bo zankoyê bixwîne di serê sala 1970yî de çûye Almanyayê û perwerdeya xwe ya endezyarîyê û mastira xwe jî li Almanyayê qedandîye. Sala 1980yî de vegerîyaye Tirkîyeyê. Li vir 32 sala di karê dewletê de xebitîye û di sala 2014an de malnişîn bûye.

Hûtî Aslan zewicîye, xwedî xwe û sê zarokan e. Bi Kurdî, Tirkî û Almanî zane. Di xwendegeha navînê de dest bi nivîsandina helbesta kirîye. Helbesta yekem ya bi navê “Dara Gûzê” di sala 1964an de nivîsîye. Jê û pê de helbestin din, di salên cûr be cûr de nivîsîne. Wekî din, xebatên mîna bîranîna, pêkenînê Kurdî û meqaleyên ku li ser mijarên di rojevê de ne dom dike. Ev pirtûka KERA BOZ ku neha di dest we de ye pirtûka Hûtî Aslan ya çapkirî ya 4emîn e. Berê pirtûka hin çîrokên Kurdî bi navê ARÎN ji bo zarokan di sala 2019an de, pirtûka AXÎN ya helbestan û CENGA MIŞK Û PISÎKAN ya çîrokan di sala 2021ê de hatine weşandin. Wekî din pirtûkek din ya evîndarîyê ku bingeha xwe li ser serpêhatîyekê ava kiriye ya bi navê “MAMEDO û ZEKO” jî amade ye, lê hîn nehatîye weşandin.

# NAVEROK


Dehşikîya min ........................................... 07
Bavê min kî bû?......................................... 09
Qantir ......................................................... 11
Mala min î nuh ......................................... 12
Aşê avê ....................................................... 17
Dizî ............................................................. 19
Hevalê min Cimha .................................... 21
Demjimêr................................................... 24
Lehî.............................................................. 26
Teyrê ........................................................... 29
Girnewas.................................................... 31
Pêşbazî........................................................ 37
Hinek serpêhatî û bîranînên min ............ 39
Xerîbî.......................................................... 53
Rêsî ............................................................. 60
Hespa mala Hemê..................................... 62
Şewat .......................................................... 64
Kew............................................................. 66
Kund........................................................... 68
Zivingê ....................................................... 70
Bêmalbûna min ......................................... 72
Liberketina Şelaqo di derbarê
mirina Kera Boz de.................................... 76

# Dehşikîya min

Ez li gundekî hêla Omerya ya bi ser Mêrdînê ve hatime dinyayê. Heya min hebekî xwe nas kir, min nerî ku ez dehşikek gewrî boz im û qet naşibim dîya xwe. Dîya min kerek qam qut, guh pahn û reş bû. Bi qasî sê mehan min şîrê dîya xwe xwar. Ji ber ku hîn ez kurîkek biçûk bûm, min nikarîbû gîha an ka bixwara. Dema karê dîya min tuneba xwedîyê me em wê rojê tevî garana gund dikirin. Gavanê gund em dibirin çola derdora gund. Kêfa min pir ji çolê re dihat. Bi domî ez li dora dîya xwe dizîvirîm û min bi kêfxweşî lotik diavetin. Di nav garanê de dehşikek din hebû dev ji min bernedida, dihat dev li situyê min dikir; ez jê pir aciz dibûm. Nedihişt ku ez li gora xwe roja xwe bi xweşî derbas bikim. Dema nîvro roj dinya gelekî germ dibû gavana em dibirin ser çemê nêzî gund, ji bona em avê vexwun. Car caran em diketin bin sîya darê dora çem. Dîya min di wê germê de xwe di nav axê de digevizand. Gevzoneka axa germ pir xoşa dîya min diçû. Wekî din li dora gola avê mêş hebûn li ser pişta me datanîn û dev li me dikirin, çiqasî

me lotik davetin lê nedifirîyan, derzîya wan mêşan pir dijwar û xedar bû, xwîna me dimijtin. Ji bo vê yeke ez pir aciz dibûm. Mala xwedê ava ku em bi terî anîne dinyê. Bi xêra terya xwe me ew mêşê bê îman difirandin.

Dema êvarî em dihatin malê, demsal havîn ba xwedîyê me em li hewşê dihiştin. Di demsalê çele de xwedîyê me em dixistin axura. Axur di demsala çele de baş germ û xweş bûn. Xwedîyê me zilamekî gelekî baş bû. Pir ji min hez dikir. Her car destê xwe li pişta min dixist û digot, tu mezin bibe wê kerik baş ji te derkeve. Ez û dîya xwe em di nav dewara de diman. Xwedîyê me êvara ka dixist alfê dewara lê xwedîyê dîya min, dîya min bi nigê wê ve girê dida, ji bo ku dîya min nere êmê dewarê din nexwe. Xwedîyê me cuherik merşînî dixist sitûyê dîya min, hinek ceh û ka dixistê, êmê dîya min ew bû. Lê min hîna şîrê dîya xwe dixwar.

Dewara piştî êmê xwe dixwarin mexel dihatin û kavêja xwe dikirin. Dîya min mexel nedihat ji ber ku di mexel de min nikarîbû şîrê dîya xwe bixum. Dîya min rebena xwedê ji bo min heya sibehê li ser niga disekini, ji bo ez karibim şîrê wê bimijim. Yanî dêtî tiştekî wisa ye. Ez tu carî heya mirinê jî dîya xwe ji bîr nakim. Her çiqasî dîya min kerek guh pehn û qam qut ba jî dê, dê ye. Xwedê jê razîbe. Her min li dîya xwe dinerî giryê min dihat, ez dehşikek bi hest bûm.

# Bavê min kî bû?

Gelek cara min ji dîya xwe dipirsî bê bavê min kî bû, kerik çawa bû. Qet bersiva pirsa min nedida. Ji bo vê yeke ez gelekî xemgîn dibûm. Gelek cara min dixwest ku ez bavê xwe di xewna xwe de bibînim, bê ka bavê min kerik çawa bû. Gelo bi rastî ez dişibim bavê xwe an na. Ji bo vê yeke her dem li ba min kêmasîk hebû, ev kêmasî tunebûna bavê min bû. Ev tunebûn her daîm ji min re dibû xemgînî.

Rojekê ez û dîya xwe em li ser bênderê jêra gund diçêrîyan. Çend kerin din jî hebûn. Kerek hebekî gewr hebû dibe ku kerê cîrana bû lê pir ne rehet û tolaz bû. Car caran bela xwe li dîya min dixist. Ez çûm ba dîya xwe, min jê pirsî, gelo bavê min ev e ku bela xwe li te dixe. Dîya min guhê xwe carek din çit kirin û got, bavê te ne ev e. Min got, yadê çima tu qala bavê min ji min re nake, ez gelekî meraq dikim; bi şevan ez ranazim ez her dem di fikara de me. Dîya min got, keça min bavê te ne ji van dera ye, cihê wî gelekî dûr e, ne mumkun e ku tu karibe

here bavê xwe bibine. Dîya min dom kir û got, “Rojek ji demsala payîzê bû, xwedîyê min barek mewîj li min kir û em çûn navçeya Midyadê. Lê belê rê gelekî dûr bû. Bê rawestandin bi seeta em meşîyan, ez pir betilim di wê rîyê de. Welhasil em çûn înhîsarê ku xwedîyê min mewîjê xwe bifiroşe. Lê belê ez çi bibînim li hewşa înhîsarê kerekî bozî şamî di hewşê de girêdayîye lê weke qantirekî ye û gelekî bi xof e. Ez jê pir tirsîyam. Wek ku ew ker kerê înhîsarê bû. Baş xwedî dikirin. Çavê kerê derdorê hemî bi dû wî kerî de bûn. Ez karim bêjim bavê te ew ker bû. Lê piştî em ji Midyadê vegerîyan û pêde min bavê te hew dît. Ez jî pir xemgîn im kurîka min î gewr î boz î xweşik.”

Piştî dîya min ev gotin, hebekî bêhna min derket. Dîya min dom kir û got: “Ez xweş zanim ku gelek xuh û birayê te ên ker hene. Dibe ku xuh û birayê te ên qantir jî hebin. Heger hebin jî, ji bavê te ne, yanî ne ji min in û ez ne dîya wan im. Lê dîya wan bergîl in.” Min got, yadê çima te ji zû ve ev nedigot, heya niha te ez hivqasî di mereqê de hiştim.

# Qantir

Min ji dîya xwe re got, yadê berî niha te got qantir, min baş fam nekir. Diya min got; keça min qantir dîya wan bergîl in bavê wan jî ker in, weke qantirê cîranê me ne. Erê du qantirê cîranê me hebûn. Yek jê mulayîm bû lê a din pir şemûz bû. Ji alîyê pêş ve gez dida û ji alîyê paş ve zîtirk davetin. Pir bi talûke bû. Cîranê me bi van qantira cot dikirin, bi wan diçûn aşa ji bona genim bikin ard. Diçûn çolê bi bara êzing tanîn; pir xurt û bi hêz bûn.

Îca pir kêfa min dihat min ji xwe re digot, gelek xuh û birayê min ên ker û qantir hene. Wekî din weke dîya min gotî, gerek gelek pismamê min ker û qantir jî hebin. Yanî xwedîyê min pir in. Dîya min kenîya û got: “Esil xwedîyê me ev mirovê ku me xwedî dikin û bi me kara dikin. Bela vêna tu baş zanibe û qet ji bîra te nere, çimkî ji alîyekî din ve jiyana me di destê xwedîyê me de ne. Heger em baş bin, wê xwedîyê me jî baş bin û wê li me xwedî derkevin. Ji bo wilo divê em xwe qet zexel nekin, yana em ê pir tahdeyê bibînin.”

## Mala min î nuh

Ez li gundê Omerya pir di jiyanek baş de bûm. Xwedîyê me em xweşik xwedî dikirin, ji ber ku hîn ez kurîkek bûm û ez ne gihabûm wê asta ku bi min kara bikin. Lê belê meh sal derbas dibûn, roj bi roj ez mezin dibûm. Ez wilo baş qebilîbûm min du cara li dîya xwe zêde kiribû. Lê belê rojekê, xwedîyê me barik tirî li dîya min kir û xelekek darînî jî xist sitûwê min û ez bi werîsek bi kurtanê diya min ve girêda, em dan ber xwe û em ketin ser rê. Ev cara yekem bû ku ez bi dîya xwe re diçûm kerwanîyê.

Berê sibehê bû, hîna rok derneketibû. Heya demê nîvro, em gihan gundeki ku bi navçeya Nisêbînê ve girêdayî bû. Xwedîyê me li wî gundî tirîyê xwe firot. Wê rojê em li wî gundî man. Bû sibeh rok derket, min nerî xwedîyê me û xwedîyê mala ku em wê şevê li wir mabûn, bi hev re diaxivin û weke ku bazarek dikirin.

Xuyaye xwedîyê dîya min ez bi çend şalê kayê firotibûm. Dîya min nikarîbû tiştekî bike. Xwedîyê dîya min barê xwe yê genim avêt ser pişta dîya min û ji hewşê der-



ketin. Lê xwedîyê malê min bi sinca hewşê ve girêda û got êdî ji îro û pêde mala te vêderê ye, tu çiqasî bi dû dîya xwe de binere bê fêde ye. Hêsir ketin çavê min, min bi dilekî şewatî bi dû dîya xwe re kûr kûr nerî heya ku dîya min ji ber çavê min winda bû. Min fam kir ku jiyan ji bo min nû dest pê kiribû. Ji wê rojê û pêde çawa min qet bavê xwe ne dîtibû min dîya xwe jî hew dît. Jiyanek nû; karê giran, tahdeyî, lêxistin ma karê min ê her roj.

Ez kerik nûgihayî û bê tecrube bûm. Min zanîbû ez ê di demin pêşerojê de bibim xwedî xwe û tecrube lê divîbû min xwe şatir bikira bêyî ez tahdeyê bibînim.  Di hewşa ez tê de, dewar, pez û kûçikek hebû. Ev kûçik pir xerab û şelaq bû, her cara çav li xwedîyê me diket xwe pirtosekî dikir, terîya xwe li vîyalî û wîyalî li dor xwe dihejand. Daxwazîya wî çend kurtêlê zêde bûn. Ji xwe ne kûçikekî esîl bû, wisa dihat xuyakirin, her dem çavê wî li kurtêla bû. Xwedîyê me bêhtir ji wî şelaqî hez dikir. Çimkî Şelaqo, nobedarê malê didît lê herdem di hewşê de çavlixew bû, hertim li ber sîya dîwara rûdinişt û serê xwe dixist nava herdu nigê xwe û tirale tirale diponijî. Mêşê dora hewşê hema dihatin li ser datanîn, ne xema wî bû. Wilo tirale bû di xwe re nedidît wa mêşa ji ser xwe bifirîne.

Wekî din li ba xwedîyê xwe gelekî bi qedir bû. Ê ku

nizanîba wê bigotona qey kûçikekî gelekî har e û nahêle zindîyek bi dora hewşê bikeve. Lê çi fêde, me herdûka jî di hewdekî de av vedixwar. Rojekê dema me av vedixwar, vî şelaqî diranê xwe nî beş derxistin û çavê xwe yê beloqî li min miç kir û xirrînî bi xwe xist. Min paşê xwe dayê û min zîtirkek avêtê. Pekîya û çû li dîwarê sênca hewşê ket, kûzînî bi xwe xist weke ku bike hewar. Xwedîyê me derket û fam kir ku min pehîn lê daye. Rahişt darekî û bi kulîmekê min ket, di wê derheqê de ez bê kurtan bûm derbin baş li min xistin 'wey tu çawa pehîna li vî şelaqî dide'. Agir û rivîn ji pişta min diçû. Çiqasî min xwe dişidand, dîsa min nikarîbû xwe li ber wan darê bê îman bigrim. Ez gelekî êşîyam heya çend roja min nikarîbû ez mexel bêm. Heya kûçîk li ser hewd ba ez nediçûm ser hewd ku ez avê vexum.

Dema xwedîyê min ez dibirim karekî, ji tirsa, ji bo dara li min nexîne ez gelekî xurt dimeşîyam, xwedîyê min nema digiha min. Weke ku bi dû min de baz dida. Her min tehdeyîk didît, dîya min dihat ber çavê min. Xwedê zane ku dîya min jî gelekî zordestî derbas kiribûn. Bi rastî bi xêra wan çend dara ez di gundê xwe de bibûm kerek rahwan. Nav û deng bi min ketibû. Car caran min dibîhîst ku gundî yê din ji kerê xwe re digo-

tin, axirê tu ji me re weke Kera Boz a mala xalê hecî ye. Dema axaftinê wisa dihatin guhê min, pir kêfa min dihat. Ez pir dilxweş dibûm. Û ev axaftin ji min re dibûn wêrekbûn û ez hîn bêhtir jêhatî dibûm.

# Aşê avê

Aşekî avê di navbera gundê me û bajarokê di ser gundê me re hebû. Bi qasî seetekê dûrî gundê me bû. Ji wî aşî re digotin Aşê Mala Şêxê Kûtê. Rojekê danê êvarê xwedîyê min barik genim li ser pişta min kir û berê min dan wî aşî. Ev barê genim bi qasî çar olçeka hebû û gelekî giran bû. Bi rastî ez di bin bar de ditewtihîm. Min dixwest seetekê berî setekê em bigihin aş ku ew bar ji ser pişta min bê danîn.

Piştî em gihan aş û pêve, me nerî ku gelek mirov hatine êş. Ne mumkun bû ku dor bigiha me. Ji neçarî divîbû em wê şevê li wî aşî bimînin. Rok çû ava, çi kesê ku li aş bûn êmê kerê xwe didan wana. Xwedîyê min jî cuherê min xist serê min. Ji betilbûn û birçîbûna kevir di cuher de ba min ê bixwara. Ceh û ka bi hev re pir xweş bû. Ji nişkave bêhna nanê şewitî hat bêvla me. Ker û qantirê di aş de hema bi hev re guhê xwe miç kirin û firrînî bi bêvlê xwe xistin, lê ka nanê biraştî kê dida kera. Meger qeraşê êş xewrak bi qasî ferik destara çêkiribû.

Qeraşê aş ji navberê ard dabû hev. Aşvanî hemûyan wê êvarê bi hev re ew xewre bi tisî xwarin. İncex sibehê dor hat me, piştî ervan hazir bû xwedîyê min barê min li pişta min kir û em vegerîyan malê.

# Dizî

Tê bîra min şevik ji şevê çele bû. Dewar hemû di axo de bûn, ga û çêleka alifê xwe vala kiribûn êmê xwe xwaribûn û kayîjna xwe dikirin. Min jî kaya ku hîn di cuherê min de mabû min dixwar. Ji nişka ve du zilamê biyanî ketin axo û ji xwe re bêdeng hêdî, hêdî diaxivîn. Min fam nekir ku ev zilam kî ne û ji bo çi ketine axo, daxwazîya wan çîye, bi rastî ez gelekî tirsîyam. Tiştê min fam kiribû, dixwestin çend dewara ji axo derxin û min jî bi xwe re bibin. Welhasil cuherê min ji serê min derxistin. Lingê çêlekekê ji singê wê vekirin. Werîsek xistin sitûyê ciwangakî nûgihayî jî, dûra bi hêdî em hemû dan ber xwe û em ji hewşê derxistin.

Kûçikê şelaqî yê xwedîyê kurtêla li kuderê di xew de bû kesî nizanîbû. Deng ji Şelaqo dernediket. Qaşo nobedarê hewşa mezin bû. Ji nişka ve ez bi dengekî bilind ziryam, her çiqasî diza dixwest ku ez bêdeng bimînim lê divîbû ez tiştekî bikim.

Di dawî de Şelaqo bi dengê min rabû û dest bi reyandinê kir. Li ser hev direya weke ku bangî xwedîyê me dikir. Ji nişkê ve xwedîyê me bi tifinga xwe ji hewşê derket û deng li kûçik kir. Kûçik li gora bêhna me da pey şopa me. Piştî qederekî xwedîyê me giha nêzî me û çend tifing teqandin. Herdu zilam bê çek bûn, nikarîbûn xurt herin ji ber ku em hêdî hedî dimeşîyan. Welhasil zilamên dizek nerîn ku tu çare ji wan re nemaye, çimkî çend malbatin gundî jî bi dengê tifinga şîyar bibûn, wan cîrana jî berê xwe dabûn me û bi lez dihatin, diza dev ji me berdan, bi bazdanek xurt revîyan û ji me bi dûr ketin. Em wê şevê ji dizîyê xelas bûn. Ji wê rojê û pêde min gelekî hez kûçikê şelaqî kir, ji ber ku jîyana min û a dewara rizgar kiribû. Di demek kurt de ez û kûçikê şelaq bibûn heval. Bi rastî hevalekî me yê din jî çêbibû. Navê wî Cimha bû.

# Hevalê min Cimha

Di hewşê de çêlekik sor hebû, çêlek li ser roja bû, piştî çend roja jê re golikek bozikî, bê hêz çêbû. Lê belê golik qet ne li ser hişê xwe bû. Nikarîbû rabe ser xwe û şîrê dîya xwe bixwe. A herî balkêş di devê golik de diranekî bi tenê hebû, ez karim xweş bêjim ev diran ji dendikekî kundura mezintir û sipîtir bû.

Xwedîyê me lê mabûn ecêmayî. Keça malê di gundê xwe de a herî xweşik û navdar bû. Gelekî şuxulker bû û ji bo zewicandinê bi tu kesî qayil nedibû. Keçika malê nerî ku wê ev golik ji nêza bimre, golik bir qata duduyan ya malê, şîrê dîya wî didot û bi kovikeke biçûk şîr bera devê golik dida, xwedê jê razîbe.

Roj bi roj golika bozikî bi ser xwe hat û rabû ser xwe. Keçika malê hertim ew di derenceyan de hildigirt û dibir qata jor. Nema li dîya xwe dibanîya, mabû bi dû keça malê de. Keça malê xwarina xwe gelek cara dida vî golikî, bi qaşlê şebeş û petêxa xwedî dikir. Di gel ku pir giran dibû, ji ber ku keçika malê roj bi roj fêrî wê giranîyê dibû,

bê zehmetî ew dîsa hildigirt. Piştî demekê ciwangakî kej î sor jê derket. Gelek cara dema min av ji hewdê hewşê vedixwar, dihat bi alî min de, hingî ez jê çavteng bibûm min nedihişt bi min re avê vexwe, min lotik davêtinê.

Keça malê navê wî kiribû Cimha. Her ku bangî wî dikir û digot Cimha! Baz dida diçû heya ser banê jor ba keça malê. Dûra ez û Cimha bi hev re bûn heval, pir henek li min dikirin, carna dihat ba min ku poşekê li min xîne, min jî zîtirk davêtin. Zîtirkê min pir xoşa Cimha diçû.

Ji ber ku pir bi delalî ew xwedî kiribûn, gelekî zexel bibû. Rojekê xwedîyê me em birin nav erda ji bo pê cot bikin. Piştî nîr xistin pişta sitûyê wî, di cih de xwe avêt erdê û hew rabû. Çend cara bi vî awayî dom kir, nerîn ku nikare cot bike. Xwedîye me nerî ku ez û Cimha heval in, got belkî Cimha bi xêra Kera Boz karibe cot bike, ez û ew xistin ber hev û nîr avêtin ser sitûyê me, hîn me du gav neavêtibûn Cimha dîsa mexel hat. Cimha hingî baş xwedî kiribûn, pir qelew û giran bû, ez jî bi xwe re dixistim. Xwedîyê me pir qeherî çend misas li tingalê me xistin. Welhasil em ji ber nîr û halet vekirin.

Xwedîyê me nerî ku bi vî awayî bi Cimha re nare serî. Gotin, em çawa bikin, divê em Cimha bifiroşin û ji xwe

re gakî bikêrhatî bikirin. Keça malê xwe li erde xist û got: “Ma nayê bîra we ku Cimha golikek nîvgiyanî bû. Min wîna di nav malê de xwedî kir û min anî vê astê. Ez naxwazim hûn Cimha bifroşin, ez pir jê hez dikim, hûn bifroşin wê dilê min biêşe û ez ê pê gelekî xemgîn bibim.” Kevanîya malê got, dibe ku em Cimha di pêşerojê de bikin dermale. Keça malê dîsa xwe li erdê xist û got tucarî ez nahêlim hûn serê Cimha jêkin û goştê wî bixun.

Lê çi heyf piştî demekî dirêj ji alîyê diza ve hat revandin. Bi meha lê pirsîn lê belê tu agahî ji Cimha nehat sitendin. Keça malê bi rojan ji bo Cimha digirya û xemgînî bi ser de hatibû. Kula Cimha ne diçû tu dera.

# Demjimêr

Rojekê cîranê me hemû li hewşa em tê de civîyabûn. Qala kirîn û firotina ajala dikirin. Ez û hevalê xwe Şelaqo li ber hewdê avê sekinîbûn. Şelaqo ji qazî ve hêdî hêdî av vedixwar ji bo ku dora vexwarina avê negihe min. Min zîtirkek avêtê, lê lê neket û bi derewa kir kûz kûz, dîsa xwest hebekî şelaqîya bike.

Di wê derheqê de hinek mitirbê ku li ser bênderê gund çadirê xwe vekiribûn ketin hewşê. Ji xwe re pars dikirin. Di destê jinekê de demjimêrek desta hebû lê ew demjimêr a zilama bû, xuya bû ji malna dizîbû. Yekî cîranê me got, ka tu wê seeta destê xwe nafiroşe, ji xwe ew seat ne ya jina ye. Jinika mitirb got, belê ez difroşim. Cîran got, dehşikek min heye ez ê bidim te ser bi ser. Jinika mitirb got, bela çêdibe.

Wî çaxî xwedîyê min î berê hat bîra min, çimkî xwedîyê min dema ez hîn dehşik bûm, bi çend şalê kayê ez

firotibûm. Tê bîra min wî çaxî bê çawa min bi dû dîya xwe de nerîbû heya ji ber çavê min winda bibû. Dîsa hêsir ketin çavê min. Şelaqo fam kiribû ku ez xemgîn bibûm. Li dora min diçû û dihat û terya xwe dihejand weke li ber dilê min diçû û dihat.

# Lehî

Demsal ber bi çele de diçû. Rojekê karê ku bi min bikin tunebû, wê rojê ez bera nav garana gund dabûm. Gavanê gund em birin jêra gund ber bestê, ji ber ku li wir gihayê şîn weke ripin tawo tawo di nav pûşê hişk de xwe dabû der, em ajal hemû tevî hev bi rehetî me karîbû em biçêrin.

Bû danê êvarî, çend perçê ewr li ezmana xwe dan hev tavek reşî tarî çê bû, çend peşkê baranê hatin lê kê bîra lehîyê dibir. Gavan ji xwe re li ser tehtekê rûniştibû, di ber xwe de distira; xwedê zane helbestê evînê digot. Di binê tehta ku gavan li ser rûniştibû, weke berqefek biçûk hebû. Dibe ku car caran gavan û şivana di demê sar de tê de ji xwe re agir dadidan, çimkî hundurê berqefê hemû ji dixanê reş bibû.

Di demekî kurt de baranê xweş lê kir, baran ne gelekî xurt bû. Lê di dawî de xuyakir ku di ser gundê me

re yanî di çîya de baranek gelek xurt hatibû, weke ku erd û ezman bibûn yek ji nişka ve lehîyeke dijwar kevir, qurmê dara ax û herrî hemû di nav hev de û bi ser me de hat. Em ajal hemû ne weke mirova bi aqil in ku em ji xwe re birevin, em rebenê xwedê ji ku zanin bê lehî çîye. Divîbû gavan me ji ber lehîyê bida alîkî, çimkî ji bo wilo bibû gavan. Lê gavanê me ji ser tahtê daket û xwe bi lez avêt hundurê wê berqefê.

Em ajal hemû bûn du qet, hinek li vîyalî û hinek jê li alîyê wîyalî bestê man. Ajalê bê taqet ku hîn zaro bûn weke golika û dahşikê ku nuh ji dîya xwe re çê bibûn, hemû li ber lehîyê çûn. Ez jî bi rasthatinî ketim bin berqefê. Gavan ji serma diricifî. Xwe bi min digirt ji bo ku pêlê lehîyê wî li ber xwe nebin, a rast ez ji gavan bi taqettir bûm.

Piştî çend seeta ew tav bela bû rok derket lê lehîyê hîn dom dikir, çimkî lehî ji alîyê çiyê de dihat. Gundî hemû bi hewarî hatin bi me ve lê li çi binerin gelek ajal telef bibûn. Ên ku gelekî dûr, heya Binya Xetê çûbûn. Ên ku di bestê de teqinîbûn, ên ku di golê avê de fetisî-bûn! Dûra me bihîst ku keçikek ji gundê me, ew jî nêzî gund li ber berxikê xwe bû, ew jî li ber lehîyê çûbû. Piştî rojan laşe wê li nêzî gundeki Binya Xetê di nav kortalê

zixurê bestê de hatibû dîtin. Ew lehî gelekî dijwar bû. Dibe ku bi sala ji alîyê mirovan ve neyê jibîrkirin, çimkî di wê rojê de gelek ajalê gundîyan telef bibûn.

# Teyrê

Rojekê wilo dîsa germ bû. Kûçkê hevalê min Şelaqo di bin sîya derîyê hewşê de pal dabû. Û ji ser xwe mêşê kûçka difirandin. Xuyabû wan mêşê bê îman dev li Şelaqo dikirin. Ez jî bi sênca alîyê hewşê ve girê dabûn û cuherê min bi serê min vekiribûn, min ka û cehê xwe dixwar. Xwedîyê me ji karekî dihat. Gava xwe di derîyê hewşê rê avêt, Şelaqo ji êşa devlêkirina mêşa bê hemdî xwe reya û xwest dev li xwedîyê xwe bike. Xwedîyê me pehînek li Şelaqo da û got axirê tu ji me re teyrê ye. Şelaqo weke hercar kûz kûz ji xwe anî û ber bi min de baz da xwest ku xwe di pişt min de veşêre.

Xanima malê ji hundur derket û got ev çi birbira te ye, teyrê çîye, kîye, çi tebe ye. Mêrê wê got: "Kûçkê me hindik mabû ku dev li min bikira vê nîv roja han. Teyrê kûçikek mêhîkî ye, bi çêlîkbûna xwe yekî serhedî ji hêla xwe anîbû ji yekî gundî yê me re. Niha bûye kûçikek gelekî bi aqil û har. Şeva nîvê şevê dev ji deng berd, pêjna xwedîyê xwe yek bi yek hema nas dike. Lê ev Şelaqo bi

sala li devê vî derî ye, hîn me nasnake. Hindik mabû ku dev li nigê min bikira. Ma ev û Kera Boz weke hev in. Dema min navê xwe bihîst, min dîsa herdu guhê xwe çit kirin, weke ez bêjim va ez li vir im.

## Girnewas

Danê êvarî bû, dengê xwedîyê min dihat bi xanima xwe re diaxivî û digot sibehê em û çend gundîyê me, em ê bi hev re herin Girnewas. Jina malê bersiv dida, çima niha tu dibêje, hîn me tu amadehîya xwe nekirîye. Xwedîyê min bersiv da, ma tê çi amadehîyê bike, em ê bedlik livîn û hinek xwarin ji bo du roja, nebû ji bo sê roja bi xwe re bibin. Jina malê got, livîn ji bo çi? Xwedîyê min bersiv da û got, dibe ku em şevekê an du şeva li wir bimînin, ma em ê li ser axê razên. Ev razana li serê gir, xwedê giravî nexweşî û êşê ji laşe mirov derdixîne.

Welhasil berê sibehê kesên ku dixwestin bi hev re derkevin ser rê, berî sitêra kerwankuj derkeve rabûn, tiştên ku ji bo wan pêwîst bûn, ê ku li kerê xwe kirin ê ku li qantirê xwe kirin, xwe amade kirin. Xwedîyê min jî xurcikek dagirtî li ser pişta min kir, bedlek livîn jî li ser kurtanê min şidandin, xanima malê jî li ser pişta min siwar bû û em bi kerwanî ji gund derketin.

Li ser rîya Girnewas, gundê yekem ku em di nav re derbas bibana, kûçkê wî gundî êrîşî me kirin. Em ker û qantir tiştek ji destê me nedihat. Bi tenê me nedihişt ku kûçik nezî me bibin. Çimkî kûçika zanîbû ku bên nêzî me em ê bi zîtirka bi wan kevin. Lê zilama destê xwe avêtin kevira û berxwedana xwe kirin. Kûçikî vî gundî gelekî no û har bûn, xwe ji ber kevir û derba ne didan alî. Heya me gund derbas kir, nîvê canê me çû. Piştî qederekî rok derket, bû sibeh. Bi xweşî me rêwitîya xwe dom kir.

Piştî em gihan Girnewas, me nerî ku di navbera gir û rîya me de çemekî mezin ku jê re digotin Çemê Bûnisra, bi nale nalî diherikî. Av gelekî xurt bû. Dar û ber li ber xwe dibirin. Zilam ji hev dipirsîn, gelo wê kerê me karibin li nav vî çemê xurt bixin û derbasî alîyê din bibin? Hineka jê digot, karin; hineka jê digot, nikarin, dibe ku ajalê me li ber vê ava xurt herin û telef bibin. Ji nişka ve kerik hûrik bi rengê xwe reş, weke dîya min qam qut û guh panî xwest pêşî bide nav çem lê weke ku tirsîya berepaş vegerîya. Lê xwedîyê wê darek li kamaxê wê xist, rebenê tingînî jê hat. Gava pêşî avêt nav avê, ji ber ku qama wê kut bû di cî de herikî bi nav çem de û avê li ber xwe bir. Lê di nava çem de du darê çinara li



ber hev û qalind hebûn, kera reş çû li wan darê çinara aliqî û ma di cîhê xwe de sekinî.

Sê çar zilaman xwe bi hev bi werîsa girêdan û çûn kera reşî qam qut xelas kirin. Xwedîyên me nerîn wisa çênabe, çend werîs bi hev girêdan û li darê qiraxa çem aliqandin û em hemû bi alîkarîya zilama, derbasî alîyê gir bûn û ber bi jor ve hilkişîyan. Welhasil em gihan serê gir.

Hîn rok ne çûbû ava, dinya xweş bû. Xwedîyê me cuherê me bi serê me vekirin, me dest bi xwarina kaya xwe nî tevî ceh kir. Em jî pir betilî bûn, lê xwedîyê me wisa fam kiribûn ku em ajal tu caran nabetilin, ji ber ku em ne mîrov bûn an em bê giyanin.

Ber êvarkî kurtanê me ji me daxistin ji bona em karibin mexel bên, an xwe di nava axê de bigevizînin. Rok çû ava dûra bayekî wisa sar dest pê kir. Zilama ji xwe re li serê gir agirek xurt î bi pizot dadan. Pîreka jî, ji xwe re livîn li nêzî tirba Girnewas danîn û ketin nav livînê xwe razan, ji bo ji laşe wan êş û bawîbûn derkeve. Em rebenê xwedê, kerê hêsîr man li rasta. Heya bû sibe, em ji serma qefilîn.

Zilaman ji gundê derdorê hinek kar û berx kirin, serê wan jêkirin û xwarinek li dar xistin, piştî xwarinê



dest bi berger û limêjê kirin. Dîsa em ker û qantirê reben man kayê bixun. Ewqas gihayê dora çem hebû, lê qet nedihat bîra xwedîyên me, bi tenê hîn bibûn kayê bidin me. Kerê hevalê me ji nêza dizirîya, xwedîyê wî wîna fam nedikir. Kerê doza gihayê şîn dikir.

Piştî du sê rojan, dîsa bi wê merezê em vegerîyan gundê xwe. Bapîrê me kera gotine, kes bi derdê kesî nizane. Tu dibê qey em ker û ajal, bi elektrîkê tên bikaranîn.

## Pêşbazî

Di gundê me de çend kerê weke min bê aqil hebûn, xwe şixulker didîtin. Di civatan de xwedîyê me bêaqilan digotin, kera min an kera me hîn xurtir e. Biryar dan ku di nava gund de pêşbazîyekê li dar xinin û bibînin bê kera kê gelekî xurt e. Lê divîbû ev pêşbazî piştî hefteyekê bê lidarxistin. Dixwestin hebekî ker bên xwedîkirin. Di vê navberê de xwedîyê me bêaqila li hev civîyan, ji bo biryar bidin bê ka ev pêşbazî bi çi rengî wê çêbibe. Li hev hatin ku piştî hefteyekê rojekê wê me bibin êzingan, weke hev barekî êzing li me kin û kîjan ker berê bigihe malê wê ew ker biserkeve û xwedîyê wê dîyarî bistîne.

Welhasil ew roj hat. Xwedîyên me em hefteyekê bi ceh û kaya hûr hûrî xwedî kiribûn, agir ji devê me diçû. Wê roja digotin em birin çolê, heryekî barek êzing li me kirin û em berdan ser rê û dan pey me; car caran darê ter li kamaxê me dixistin, tingînî ji kamaxê me derdiketin. Ço û hey ço! Her kerek ji êşa laşê xwe û di bin wî barê giran de de bimeş ka bê kîjan ker pêşî bigihe gund.

Xwedê zane û gundî hemû jî zanin ku ez Kera Boz bi nav û deng im, navê min li derdorê bela bûye. Gundî hemû derketine nava gund li ben de me ne bê pêşî kîjan ker tê nava gund. Du kerê ji min hîn ciwantir li pêşîya min bûn, ji ber ku rê gelekî teng bû min nizanîbû bê ez ê çawa di wan bibuhurim. Heya em gihan derek hebekî fireh min da xwe û bi carekê re ez ketim pêşîya wan û min lezand. Piştî çend demhûra, ez berî hemû kera giham nava gund. Gundîya hema ji min re li çepika xistin. Min wê rojê ew pêşbazî qezenc kir.

## Hinek serpêhatî û bîranînên min

Rojekê ber êvarkî, xwedîyê min di ser sênca hewşê re bangî cîranê me kir. Cîran bersiv da û got, çîye cîran xêr e înşelleh. Xwedîyê min got; xêr e, ger tu jî bixwaze sibe dinya xweş e em bi hev re herin çîyê, êzingan. Cîran got, bela. Bû sibeh, kurtanê me li ser pişta me şidandin, das, bivir û werqîl bi werîsa li ser kurtan girêdan û berê xwe dan daristanê li dora gundê me.

Rê tim di nevala de ne. Lê nerîn ku tu êzing an çilo li derdora rê nemane. Divê em hebekî bi alîyê kaşan de herin, heya bigihên daristana dar qalind. Ji xwe tê zanîn, em ker ji mirova bêhtir şêhatî ne, ji alîyê çûn û hatina di kaşan de. Di kaşê bilind ê weke berwarê tîkane de, ker bêhtir zanin fitloneka bidin xwe û hilkişin an dakevin.

Em gihan daristanê ku xwedîyê min û cîranê xwe êzinga bikin. Piştî du seetan êzingê xwe qedandin, em anîn ku êzinga li ser me bar bikin. Piştî barê me girêdan heryekî darek li kulîmekê me xistin û gotin yalla bimeşin. Kera cîranê me kerek hûrikî gewre bû, da pêşîya

min û meşîya. Dema xwest bi alîyê berjêr de dakeve hat xuyakirin ku barê wê gelekî giran bû, çend fitlonek dan xwe û meşa xwe dom kir. Di fitlonekekê de barê wê bi alîyê newalê ve xwar bû. Meger navtenga kurtan xweş nehatibû girêden. Ez bi qasî deh metran li paşî wê dimeşîyam. Tiştê min dît, kera gewr tevî bar û kurtanê xwe qilopazî bû, çend cara bi dû hev de qulipî û bi alîyê jêr de hat xwarê. Xwedîyê wê bi tenê mabû lê binere û digot batil, batil çawa hat xwarê. Nerîn ku lingê kerê ê pêş jikestîye û ker nema kare bimeşe. Xwedîyê wê hewarî li gund danî, çend mirov bi wan ve hatin, ker ji wî kaşî xelas kirin. Lê her çiqasî lingê kera gewr hat cebirandin jî, nema karîbû here tu karî. Min hew ew kera gewr dît nizanim bê çi pê hat.

***

Xwedîyê min ji bo çend rojan çûbû bajarê Mêrdînê, lawikê malê a din î rojê nexweş ket. Dîya wî rabû ez ji axo derxistim, kurtanê min li ser pişta min şidand. Bi qasî du olçek genim xist xurcikekê û avêt ser min, lawikê biçûk jî li min swar kir û me berê xwe da ku em herin gundê Darê, çimkî li wî gundî sixîyek hebû bi xwe ne bijîjk bû lê ji nexweşîyan fam dikir. Axirê me da ser rê. Dinya pir germ bû. Piştî seetekê em gihan ser çalek avê ku li binya gundê Gurik dîmîne. Hewdê avê tije ki-

rin, min têr av vexwar. Lawik jî hinek av vexwar, dîya wî hinek av li dev û rûyê wî kir, ji bo hinek germahîya wî dakeve. Dîsa me da ser rê.

Li ser rîya me em li tehtekê rast hatin, tehtek pahn î weke merşekî fireh. Li ser tahtê xetek dirêj û sor ji serî heya serî hebû. Lawikê biçûk ji dîya xwe pirsî, got, yadê! Dîya wî bersiv da û got, çîye layê min tu baş e inşallah, hindik ma em bigihên ba textor. Lawik dubare kir û got, yadê ev çi xeta sor e li ser vê tehtê, dişibe xwînê? Dîya wî got, lawo tu rast dibêje, ev xwîn e. Lawik got, ma xwîna çîye? Dîya wî got, xwîna mirovekî ye lawo. Lawik got, çima hivqas xwîn di mirova de heye ku heya hivqasî biherike. Dîya wî got, ev çîrokek dûdirêj e. Lawik got, yadê ka vê çîrokê ji min re bêj. Dîya wî got ez betilîme. Lawik got, were tu jî li kerê siwar be. Wî çaxî tu kare vê çîrokê ji min re bêje. Dîya wî ez birim ber kevirekî bilind, çû ser kevir û li pêşîya lawik li ser min swar bû. Bi rastî barê min pir giran bû. Mam ku hêdî hedî bimeşim. Lawik dîsa doz li dîya xwe kir û got, ka bê ev çi çîrok e yadê, ka ji min re bêje. Dîya wî dest bi çîrokê kir lê ez jî hêdî hêdî dimeşim û dixwazim li vê çîroka balkêş bihishisim bê ka çima xwîna vî mirovî li ser vê tehtê wisa herîkîye.

***

Demsal havîn bû, xelkê zadê xwe hilanîbûn. Xwedîyê min ji bona karekî gelekî taybet, çûbû bajarê Mêrdînê. Xanima malê karûbarê xwe dikir ku here gundê Kindîrîbê, cihê ku keçik wan li wê derê li ba mêr bû. Rojekê serê sibehê berî roj hilê, xurcikek genim li ser pişta min danî û lawikê malê ku bi qasî deh duwazde salî jî li min siwar kir û em ji mal derketin. Dewlik bi kurtanê min ve gire dabûn ji bona gava em tî bibin ji çalê ser rê avê pê bikşînin.

Heya mêja nîvro me gundên Stilîlê, Kurikê, Hebîsê û gundê Sada derbas kir. Lê belê ez gelekî di bin bar de betilîbûm. Ez tî û birçî bibûm. Min ji xwe re digot, xwezî min karîba bi mîrovan re biaxivim û karibim derdê xwe bejim.

Piştî me gundê Sada derbas kir em gihan ser çalekê ku di demê çele de ji ava baranê hatibû dagirtin. Xortê biçûk ji dîya xwe re got: "Yadê ez li ser kerê qerimîm. Ez dixwazim hebekî dakevim û bêhna xwe berdim, dibe ku Kera Boz jî tî û birçî bûbe. Em jî hebekî avnê vexwin." Welhasil em sekinin, lê ez di bin bar de mam, bar giran bû nikarîbûn barê min deynin û carek din bar li ser pişta min deynin. Hewdê avê ji min re dagirtin û min têr av vexwar, cuherê kayê bi sitûyê min vekir, min dest bi xwarina kayê kir. Xanima min li ser ferşekî ke-



virî dest bi mêja nîvro kir. Xortê malê jî hinek nanê tisî dixwar. Hingî birçî bibû, te digot qey goşt dixwe.

Piştî me baş bêhna xwe berda, me dest bi rêwitîya xwe kir. Weke ku xanima min ji layê xwe re digot, rîya me gelekî dûr bû. Dibe heya êvarî em negihên gundê Kindêrîbe. Rê hemû kevir û axa hişk bû. Rê bi tenê şivîlek bû. Ez giham derek wisa teng, lingê min li ser tehtekê şexîtî çerixî û ez bi ser herdu kabokê xwe ve çûm ser rûwê erdê, pê re lawik jî ji ser min hat xwarê û serê wî li kevirekî ket û dev û rûwê wî di nav xûnê de ma. Xort dest bi girî kir, dîya wî bi kulma bi sênga xwe ket û li wê çolê kir hewar, lê tu kes li wan dera tunebû.

Xanima min hinek sixtîyan ji qoşa kurtanê min jêkir û danî ser dera şikestî. Pê re xwîn sekinî. Xort hew girya. Xanima min terîşik ji kitana xwe çirand û li serê lawik girêda, ji bona ku rok lê nexîne. Bi dara bi kemaxê min ketin, ji bona ez rabim ser xwe lê min çiqasî da xwe ku ez rabim, dîsa ez diketim kabokê min jî hemû selixîn. Welhasil ez nema karîbûm rabim.

Xanima min pir bi aqil bû. Rabû şahra serê xwe li ser tehtê raxist û xurcika genim qulpand ser şahra xwe, hemû vala kir. Piştî ew bar ji ser min hat daxistin ez rabûm ser xwe. Ez di nav xwêdanê de mabûm. Te digot qey ez ji nav golek av derketime. Min êşik mezin didît.

Lê xanima min fam nedikir bê ez çiqasî êşîyame. Xwezî min karîba bê ay. Piştî ez rabûm ser xwe, xurcika vala dîsa avêtin ser pişta min û ew genim hemû bi dewlê vala kirin xurcikê. Piştî demeke direj, me dîsa dest bi rêwîtîya xwe kir.

Rok çû ava, reş ket erdê em gihan gundeki bi navê Koza, nasekî xwedîyê min li wî gundî hebû. Xanima min, em birin devê derîyê wê mala dostê xwe. Xwedîyê malê pir qedir dan me. Bi me ve hatin barê genim ji ser pişta min daxistin, kurtanê min ji min kirin, pir bêhna min derket. Piştî min êmê xwe xwar, ez heya sibehê mexel hatim. Lê êşa laşê min nesekinî û dewsa wan darê ku li termalê min ketibûn hîn têşîyan.

Bû sibeh, xwedîyê mala ku em li bûn kurtanê min li min kir, barê genim avêt ser pişta min û xortê xwedîyê min jî li min siwar kir û me berê xwe da gundê Kindêrîbê. Berî mêja esir em gihan Kindêrîbê. Rêwîtîya min bi awayekî ne xweş derbas bibû.

***

Bi navê Hesen cîranekî xwedîyê min hebû. Bi kurtayî jê re digotin Heso. Heso û jina xwe herdu di temenê hev de bûn. Tu zarokê wan çênebibûn. Yanî kurdûnde bûn. Ez karim bejim, ji alîyê din ve jî bêxwedî bûn. Tu xwedîyê nêzî herduka jî tune bûn. Bi tena serê xwe, di xanîkî

biçûk de bûn. Tu mal û mewdanê wan jî tune bû. Bi tenê kerik wan hebû. Kera Heso, kerik qamqut î guh pan û reş bû. Di nav civakê de jê re digotin, kera kurmancî. Me nizanîbû bê çima ji min re digotin 'kera şamî' an jî ji kera Heso re digotin 'kera kurmancî'; ev nav ji ku hatibû me nizanîbû. Malbata Heso pir belengaz û di rewşek xizan de bûn. Heso xwe bi firotina êzinga xwedî dikir.

Heso, her sibeh wê raba kera xwe ji axo derxistiba, kurtanê wê lê kiriba û bivir û werqîlê xwe li ser girêdaba û berê xwe dida daristana nêzî gund. Her roj bi vî awayî diçû barik êzing tanî û adin î rojê ew êzingê xwe dibir navçeyê firotinê. Bi perê heqê êzinga xwarin û pêwistîyê malê bi cîh tanî. Lê belê hivqasî barê kera xwe giran dikir ku kera reben nikarîbû di bin barê xwe de bimeşîya, yanî bi tewtihandin diçû û dihat.

Bi rastî ew ker bi qasî min ne bi quwet bû. Lê dile min pê dişewitî. Rojekê barekî gelekî giran lê kiribûn û diçûn navçeyê. Di nîvê rê de li karmendekî bacê rast tên. Karmendê bacê dibêje, xalo ku tu here bajêr tê van êzingê xwe bi çiqasî bifroşe. Hesen heqqekî dibêje, karmend dibêje ez ê jê bêhtir pera bidim te lê divê tu barê êzingê xwe li vê çolê deyne, ez ê heya bajêr li kerê swarim, çimkî ez gelekî betilîme. Yek ji Hesen yek ji karmend. Di dawî de Hesen barê êzingê xwe berî bigihe

bajêr li nîvê rê diqulpîne. Karmend li kerê swar tê lê gelekî tahdeyê li kerê dike, heya ker digihe bajêr di nav xudanê de dimîne. Hesen karmend li bajêr datîne û carek din li ezingê xwe vedigere.

Carek din Heso barê êzingê xwe bar dike û dîsa dibe bajêr. êzingê xwe difroşe. Lê li Heso dibe êvar. Di nîvê şevê de Heso digihe malê. Dibe sibe Heso li devê derîyê xwe rûdinê û serê xwe dixe ber xwe û digrî. Xwedîyê min dipirse, cîran çi qewimîye çima tu digrî? Heso bi kelûgirî dibêje: "Kera min şevê din mir. Ez mam bê ker. Kera min dest û nigê min bû. Ji îro û pê de ez ê çawa êzinga bibim bajêr. Ma em ê xwe bi çi xwedî bikin?" Xwedîyê min ji Heso re digot: "Heso hivqasî te barê kerê giran dikir. Ker jî weka mirova zindî ne. Ji bona naaxivin, nikarin derdê xwe bêjin." Xwedê heye, xwedîyê min tu carî wisa barê giran li min nekirine. em ker nikarin mirovan hemûyan weke hev bibînin. Di nav mirovan de gelek qenc jî û gelek xirab jî hene. Îca ji bona van axaftinê xwedîyê min, ez mam ecêbmayî û ji alîyekî din ve pir kêfa min jî hat.

***

Gundê me di navbera Omerya û hêla berîyê de dimîne. Her çiqasî derdora gundê me bê dar û ber be jî dîsa di demsala biharê de şînkayî çê dibe. Em ajal hemû têde

diçerin. Car caran xwedîyê min, bi cîranê xwe re mijûl dibû, qala daristanê hin deman dikir. Li gora digot, di nav daristana derdora gundê me de kes kesî nedidît. Çima daristan qelîyan kes nizane, lê hîn di ser jora gundê me re yanî hêla Omerîya daristan heye. Dera daristan lê hebe, di mehê payîzî de car caran barana xurt tê, dibe lehî jî radibe û her tiştî li ber xwe dibe.

Rojek ji van rojên payîzê ku dibistana gund nû ava bûye, sala yekem e zarokê gund dest bi pola seretayî kirine û hemû li dibistanê ne. Mamoste dest bi fêrê kirîye, li ezmana tu ewr tuneye. Roj e û dinya xweş e, lê belê li hêla Omerya ewr heye, baranak xurt bi lotikî hatîye lê gundîyê me bi vê baranê nizanin.

Mamoste di pencereyê re dinere ku lehî rabûye çawa teht û kevira li ber xwe dibe. Dibistana gund dûrî gund e. Di navbera gund û dibistanê de bestik hişk derbas dibe lê li ser vê bestê tu pir tuneye, li gora digotin berê çemekî mezin ku aşê avê li ber digerîyan hebû. Mamosteyê bêçare li gund dike hewar û lehî tê û derbasî jêra gund dibe. Xwendevan hemû di dibistanê de dimînin û kesek nikare ji alîyê gund derbasî alîyê dibistanê bibe. Zarok hemû di temenê 6-7 salî de ne û gelekî tirs bi wan re çêbûye.

Hebekî lehî kêm bû xwedîyê min li min swar bû û berê min da nav wê lehîya xurt û bê îman. Di wê derheqê de

çiqasî min dixwest ku ez zanibim bi mirovan re bi zimanê wan biaxivim û bibêjim, kuro ez ditirsim û ez nikarim derbasî alîyê dibistanê bibim. Lê gotin bêfêde ye. Cara yekem min nexwest ez bidim nav lehîyê lê çend dar li termale min ketin, min ji êşa xwe re xwe avêt nav avê, lê av gelekî xurt bû, ez hebekî li ber çûm lê ez li ber tehtekê mam aliqî û min da xwe û bi zorê ez derbasî alîyê dibistanê bûm.

Her car bi qasî çar zarokan li ser pişta min dişidandin û min derbasî alîyê gund dikirin. Heya bi yê dawî, min zarok hemû derbasî alîyê gund kirin. Xwedîyê min digot, ev Kera Boz e, weke bahoz e! Dema min ev gotin dibihîst min jî guhê xwe çit dikirin û bi vî awayî min bersiv dida xwedîyê xwe. Ez bi hêvî bûm ku êvarî êmikî baş û têrceh têxin cuherê min û bi serê min vekin ku ez têr bixum.

***

Cîranekî me bi navê Birahîm hebû. Xelkê jê re digot Biro. Biro kesekî bi tena serê xwe bû. Jiyana xwe di xanîyekî nîvxerabe de dom dikir. Rewşa Biro ji alîyê aborî ve jî ne baş bû. Biro di nav kul û derda de mezin bibû. Dema xort bû, ji keçikek gundî hez kiribû. Welhasil bi wê keçikê re zewicîbû lê çi fêde di demek kin de, berî ji Biro re zarok çêbibin jina Biro dimre.

Piştî jina Biro dimre, Biro hew dizewice û ji ber vê yekê Biro bê dûnde dimîne. Bi tenê kerek Biro hebû. Kera Biro kerek qam qut û guh pehnî bû. Li gund tu ava li herik tunebû. Li gora bapîra digot, li gund ava li herik hebû lê berî çend sala çikîyabû, hew ew av diherikî. Gundîyan ji xwe re çalê avê kolandibûn, demê zivistanê ji ava baranê tije dibûn û demê havînî ew av didan ajalê xwe û wan jî ji neçarî car caran ew ava çala vedixwar.

Kanîyek ku ji gund bi qasî şeş km dûr bû, avek cemidî û zelal jê derdiket. Biro bi wê kera xwe, çi roja heye ji sibehê heya êvarê ji wê kanîyê av dikşand û bi perekî hindik difirot gundîyan û debara xwe bi wan pera dikir. Lê kera Biro ji betilbûna û ji barê giran rojek hat nema karîbû bimeşe. Dema êvara ku Biro hew diçû avê, kurtanê kera xwe jê dikir, xuya dikir ku pişta kerê hemû bibû birîn. Biro qet li kera xwe ne dinerî. Çimkî rewşa wî ne baş bû, ji lewma nikarîbû kurtanekî baş ji kera xwe re bikire, an bide çêkirin.

Rojekê xwedîyê min got, cîranê Birahîm pişta kera te hemû bûne birin û kera te ji birçîbûna maye hestî. Biro digot, cîran tu zane derfeta min tuneye ku ez êvara êmin baş bidim kera xwe. Xwedîyê min carek din deng li Biro kir û got, ka çend roja nere avê bela kera te bê hewşa me, dibe ku di nav ajalê me de hebekî êm bixwe,

dibe ku pişta kera te rehet bibe. Biro got, na cîran divê ez her roj herim avê bikşînim, çimkî ez nerim avê ez ê jî ji birçîbûna bimrim. Çend roj derbas bûn kera Biro ji êşa birînê xwe, li ser rîya kanîyê di bin tenekê avê de jiyana xwe ji dest da.

Biro, kera mirî li wê çolê avêt qiraxa besta hişk û dev jê berda. Ez pir xemgîn bûm. Û ez gelekî tirsîyam ku dawîya jiyana min jî bi vî awayî be. Candar hemû bi tevayî, em ker weke mirova zindî ne û em hemû bi giyanin. Ji bona ku em nikarin li ber xwe bidin em hemû bûne hêsîrê mirovan. Em jî merhametê dixwazin.

***

Rojekê di demê cotkarîyê de, xwedîyê min xwest ku here nav zevîyê xwe û çend latê ku mabûn cot bike. Xwedîyê min bi qantira cot dikir. Nîr û gîsin li ser pişta min girêdan û hevsarê qantira jî bi kurtanê min ve aliqandin û me da ser rê ku em herin nav zevîya. Berî em bigihên, nav zevîyê xwe, yekî gundîyê me li qiraxa rê bi kera cot dikir. Dema çavê min li rewşa wan kera ket, ez pir êşîyam, çimkî kera bi zorê halet dikşandin; cot ji kera re tiştekî zêde bû, taqeta kera têra kişandina haleta ne dikir. Bi ser de xwedîyê min, nebêje ka ez binerim bê cotê kera çawa ye. Dema xwedîyê min quweta xwe berda ser halet, gîsin di nav axê de kûr daket û kerê

reben di cîhê xwe de man sekinî. Xwedîyê min li gora qantirên xwe diçû. Di vê navberê de, qantirê xwedîyê min yek jê şehmoz bû, da zîtirka. Çend zîtirk avêtin min û qantira din. Zîtirkek jê li kamaxê min ket, dewsa nalê wê di laşe min de cîhê xwe derxist. Xwedîyê kera dest bi cotê xwe kir, lê bi misasa xwe bi kera ket, çawa we ez li hemberî gundîyê min fedîkar derxistim. Kera ji êşa re, xwe ditewtihand lê çi fêde…

# Xerîbî

Piştî ez bi dehşikî hatim firotin û ez mam bê dê û bê bav, ji ber ku hîn ez zaro bûm min nizanîbû bê xerîbî çîye. Lê di nav mala ku ez têde mezin bûm û bûm kerik bi nav û deng, ji neçarî min ev mal ji xwe re kir cîh û war û xwedîyê malê jî ji min re bûn dê û bav.

Xanima malê ew jî gelekî jêhatî bû, di zarokîya xwe de zewicîbû û bibû xwedî xwe û komek zarok. Di jiyana xwe de ji kar û barê malê gelekî betilî bû. Herdu çogê wê kils girtibû. Di wan deman de tu bijîjkê ku karibe jê re çareserîyekê bibine tunebû. Nema karîbû rabe ser xwe, em karin bêjin ketibû derê malê. Her şev dikir hewar hewar ji ber êşa çogê xwe. Qêrîna wê diçû ezmanan. Ji ber wê êşa giran, bi şev nikarîbû razê. Ji bo xanima malê, pir dile min dişewitî lê ez çi bikim ez ker bûm û tu tiştekî ku ji destê min bê û ez ji xanima xwe re bikim tunebû.

Rojekê zilamekî dostê xwedîyê min, hatibû mêvanê me. Wî digot, li Çermûkê avgermek heye. Ku çend roja

lingê xwe têxe nav wê avê, dibe ku ew êş ji çogê wê derkeve. Welhasil xwedîyê min, malbata xwe da hev û biryar dan ku xanima malê bibin Çermûkê, lê di wan deman de tu wasite raste rast nediçûn Çermûkê, divîbû em bi lingan herin. Dîsa kare herî mezin li pêşîya min bû. Weke agahîyê hatin, Çermûkê devereke dûr e û bi bajarê Amedê ve girêdayî ye. Ez gelekî tirsîyam, çimkî heya niha ez wisa dûr neçûbûm tu dera. Û ji mala xwe derneketibûm, ji bo min weke xerîbîyê dihat dîtin. Min nikarîbû bejim, ez nikarim herim wî qasî dera dûr. Piştî çend rojan xwe dan hev û xwe ji bo rêwîtîya Çermûkê amade kirin.

Ew roj hat, serê sibehê berî roj derkeve bi stêrka kerwankuj re dîsa ew kurtanê giran li min kirin, bedlek livîn li ser min şidandin. Ji bo çend roja xwarin jî amade kiribûn, ew jî xistin xurcikekê û di bin bedlê livîna de li ser pişta min werkirin û şidandin, mabû ku em bidin ser rê. Di binya gundê Gurik re, me berê xwe da bajarê Mêrdînê, em gihan nêzî gundê Darê û roj derket. Me rîya xwe dom kir.

Em gihan Qesra Qelendera germahîyê dest pê kir. Di binya gund re bîrîk avê hebû, li dor bîrê çend darê tuwa hebûn. Xwedîyê min xanima xwe ji ser min daxist û li bin sîya darê danî, ji bîrê dewlek av kişand, ava xwe vexwarin û hewdek hebû çend dewlê avê jî ji bo min

kişandin, min jî têr ava cemidî vexwar. Hinek xwarin derxistin ku bixun, xwedîyê min li min nerî, min jî guhê xwe çit kirin weke ku min jê xwest ku ez birçîme.

Camêr cuherê min berê tije kiribû bi ka û hinek ceh danîbû ser kayê. Cuherê min bi serê min vekirin. Min hem kaya xwe dixwar û bi terîya xwe ji ser xwe ew mêşê kera ê bê îman difirandin. Xwedê kir ku terîya min hebû ya na wê mêşa ez xwaribama. Piştî me baş bêhna xwe berda, dîsa xanima min li min siwar bû û me berê xwe da bajarê Mêrdînê. Berî roj here ave, me gundê Girherînê derbas kir. Lê belê heya em gihan bajarê Mêrdînê, di wan newalê berbi jêr de em gelekî betilîn. Ez û xwedîyê min, em di nav xudanê de man.

Xwedê jê razîbe, zilamekî Xana Surûrê pêş me kir. Em wê şevê li wê xanê man. Me şeva xwe bi xweşî derbas kir. Xanima min bi şev gelekî nekir hewar hewar. Serê sibehê berî roj derkeve, me dîsa da rê. Em gihan Şêxan (Sultan Şêxmûs ) roj derket. Şêxan deverek bi av û dar û ber bû. Ew cîh weke ziyaretekê tê dîtîn. Her roj xelk ji derê dûr tên vê derê. Ji xwe re xwarinê çêdikin, ajalan serjê dikin, mûlidan didin, yanî şêxan derek ji alîyê olî ve tê naskirin. Wekî din cîhekî gelekî bi nirx e. Pir kêfa xanima me ji wir re hat. Got, min ji Kera Boz daxin, ez dixwazim

hebekî li vir rawestim û em hebekî xwarina vê zîyaretê bixun, dibe ku ji min re bibe şîfa.

Pir kêfa min jî hat. Heya em li vir bimînin, wê barê min sivik bibe û ez ê jî êmê xwe bixum. Vêderê ji bo min derek gelekî nuh bû, min xwe weke yekî xerîb didît. Derdora min tije ker, qantir, hesp bûn. Kerekî boz hebû. Pir bala min kişand. Dema min ew kerê boz dît, weke çûkekî ji ser dilê min firîya. Hêsir ketin çavê min. Axaftinên dîya min hatin bîra min, min got qey bavê min e. Qama wî weke qama min nedihat, lê hîn kerekî xort bû. Weke ku ez di nav sala de çûbûm, ez qanî bûm ku ne bavê min e. Lê ez pir xemgîn bibûm. Wî kerî jî gelekî li min dinerî û guhê xwe miç dikir. Xanima min ji mêrê xwe re digot, ka em çend roja li vê zîyaretê bimînin. Çimkî vêderê pir xweş e. Lê xwedîyê min got, na em rêwî ne divê em rîya xwe dom bikin, hîn rîya me dûr e.

Piştî du seeta em dîsa ketin ser û me rîya xwe dom kir. Bi rastî min nuh fam kir ku berê me ketîye xerîbîyê. Piştî demek dirêj roj ber bi êvarê de diçû. Me bi zorê xwe gihand gundê Xanika. Em gihan qiraxa malekê, li wir livîn daxistin ji ser pişta min û kurtanê min ji min kirin. Hindik mabû pişta min bibe birîn. Bi şev hebekî hênkayî hebû. Berî em razin, mala ku em li nêzî wê

rawistîya bûn ji me re hebekî şîva êvarî anîn, xwedê ji wan razî be. Em wê şevê li wî gundî razan.

Berî dîk ban bidin em rabûn, bêyî his û deng em ji gundê Xanika derketin û me berê xwe da navçeya Çinarê. Piştî me Çinarê derbas kir, bi nîvê şevê re em gihan bajarê Amedê. Jê re digotin Mardîn Qapî (Deryê Mêrdînê), em li wir rawîstîyan. Bi qasî çend seeta me hebekî bêhna xwe berda, lê xanima me dîsa dest bi qêrîna xwe kir. Ay kabokê min ay kabokê min! Wê rojê em dîsa meşîyan, xanima min ji êşa lingê xwe dest bi gotina helbestekê kir. Digot:

Kera Boz e gelekî xurt e

Weke bahoz e, me li tu rîya nahêle

Ji me re pir dilsoz e

Ço qurban ço

Bi wî awayî strana xwe dom dikir. Welhasil bi demê esirkî re me xwe gihand Avgerma Çermûkê.

Li dora Avgermê xanîyê biçûk ji bo kesên ku tên Avgermê çêkirine. Xwedîyê min ji xanima xwe re got, em ê bi qasî deh rojan li vir bimînin. Pir kêfa min jî dihat, ji ber ku ev çend roj bûn ku em di rîya de ji meşê perîşan bibûn, bi kêmanî min ê jî baş bêhna xwe berda. Xwe-

dîyê min, ji wan xanîya ji bo deh roja yek ji xwe re kire kirin. Dema te li dora Avgermê binerîya, ji mirovan û ajalê wana te ax bavêta ne diket ser rûwê erdê. Kesê ku bi kera, ên ku bi hesp û qantira, hinek jê ji dora Rihayê bi deva hatibûn Avgermê.

Xanima min her sibe, bi qasî du seeta diket nav ava germ. Ez jî mabûm bê kurtan û nêzî xanîyê kirekirî girêdayî, geh bê cuher, geh bi cuher min kaya xwe dixwar. Carna xwedîyê min diçû ji dora Çemê Çermûkê gihayê şîn tanî ji min re. Dîsa min çavê xwe digerand gelo dibe ku ez dîya xwe an bavê xwe bibinim. Lê çi fêde gelek sal derbas bibûn, kî zane bê bavê min an dîya min li kû ne. Ez her dem bi hesreta dê û bavê xwe bûm. Di wan rojan de li wê xerîbîyê min gelek ker û pismamê qantir dîtin. Herdem çavê min bi hêsir bûn. Xerîbî ne xweş bû. Min bêrîya hewşa xwe dikir.

Deh rojê me qedîyan, xanima min bi wê avgermê rehet bû. Nema dikir qîr qîr. Pir kêfa wê dihat digot, ji îca û pê de ez ê ji xwe re têr razim. Xanima min, bi dengekî bilind weke zengil bangi mêrê xwe kir û got: “Were bes e, ez niha pir baş im nema kabokê min têşin, min bêrîya mala xwe kirîye. Hewşa me maye vala. Zarokê me tena serê xwe mane. Çi dibe çi nabe. Hezar belê dinyê hene.”

Dîsa livînê xwe li ser pişta min kirin û xanima min li min siwar kirin û berê me ket ber bi vegera malê de. Di van çend rojê derbasbûyî de, min jî qederekî bêhna xwe berdabû, Çimkî min tu kar ne dikir û ez di nav mêrgê derdora Avgermê di nav şînkayê de diçêrîyam, min jî betlaneyek baş derbas kir. Dîsa ez ketim tirsa ku li malê têkevim bin wan karê giran.

# Rêsî

Meha gulanê bû, wê salê gelekî baran hatibû. Dora gundê me, bi piranî cihê ku daristan lê hebû hemû der ji gîha şîn bibû. Gîha hivqasî pir bû, ji bo me ajala tiştekî gelekî baş bû. Rojekê xwedîyê min got, em ê sibe bi malbatî herin rêsîya bikin. Weke ku tê zanîn rêsî ji gihayê şîn çedibin. Di dema biharê de ew giya tê çinîn û dûra wî giyayî li hev badidin û hiltînin. Di demsala çele de xelk wan rêsîyan derdixin û didin ajalê xwe, pir kêfa dewaran ji wan rêsîyan re tê ji ber ku ew gîha hîn weke xwe şîn dimîne. Pir kêfa min bi wê axaftina xwedîyê min hat.

Bû sibe malbat bi koçimalî rabûn ser xwe, ji bo rojekê ji sibehê heya demê êvarî xwarin û vexwarinê xwe li ser pişta min kirin û berê xwe dan daristana jora gund. Em gihan cîhekî wilo bi gîya şîn û bilind hatîye xemilandin, te digot qey deryakî şîn e û li pêşberî me ye. Biryar dan ku em li vêderê bisekinin û dest bi çinîna gîha bikin. Barê xwe ji ser pişta min daxistin û ez bi nigê ve girêdam ji bo ku ez ji wan bi dûr nekevim. Xwedîyê min

kurtanê min ji min kir û şiqamek bi şida li kamaxa min xist û got, de di nav vî gihayî de biçêr heya ku tu bifetiqe. Pir kêfa min nehat, ji kêfa ku ez giyayê şîn bixum qet şiqam ne di bala min de bû.

Piştî çend seetan du xortê ku birê hev bûn li ber pezê xwe diman, yanî şivantî dikirin, bi qasî sêsid metreyî dûrî me bûn. Yek ji xorta çûbû ser tehtekê û ê din li jêra tehtê bû. Li gora xwedîyê min ji zarokê xwe re digot, van herdu xorta çêlîkekî rovîya dîtine û dixwazin wî çêlîkî bigrin. Lê xwedîyê min digot, yek ji wan xorta bi zimanê Erebî diaxive û ji birê xwe re dibêje, rovî nêzî te ye wî bernede. Carek din xwedîyê min digot, gelo ev rovî bi Kurmancî zane ku xort bi birê xwe re bi zimanê Erebî diaxive. Di wê derheqê de min çiqasî dixwest ku ez bi zimanê mirova zanibim, min ê bigota xortno dev ji wî çêlîkê berdin, gelekî gunehê ji ber ku hîn çêlîk e.

Axirê wê rojê malbatê têra xwe rêsî kirin, dawîyê ji rêsîyan li ser pişta min lodek çêkirin, wan jî hinek li pişta xwe kirin û ber êvarkî malbat em tevde wilo vegerîyan malê.

## Hespa mala Hemê

Li jêra gundê me çîyayê bê daristan hene. Hinek ji derî welat hatibûn ku li van çîyaya li petrolê bigerin, dixwestin ji bo rojekê hinek ajal ji xwe re kirê bikin. Ji ber ku wasitê wan nikarîbûn di kaşa de herin. Li gund ji wan re gotine, Kera Boz û çend kerên din yên xurt hene. Lê ji bo serekê şirketê peya nemîne hespek dixwestin. Keyê gund got, hespa mala Hemê hespek baş e. Werhasil van xerîban çakûçê xwe, bivir û bêrê xwe li ser pişta me şidandin û serwerê şirketê li hespê siwar bû û dan ser rê, ji xwe tu rê tunebûn hemû taht û kevir bûn. Em ajal ji mecbûrî li ser wan teht û keviran dimeşîyan. Carna nigê me diçerixî, dîsa dar li kamaxê me diketin.

Em gihan panavek rast hemû axa nerm bû. Serwerê ku li hespê swar hesp bezand, carê herdu nigê xwe li bin zikê hespê dixist, ji êşa re hesp xurtur diçû. Min berger dikir ku ew zilam ji hespê bê xwar û derin wî bişkê. Ji ber ku min zanîbû bê hesp çi êşê dikşîne. Li wî çîyayî ji sibehê heya êvarê em gerandine û kevir û ax dane hev,

Xwedê giravî ji wan ax û kevira wê zanibin bê li van çîya petrol heye an na.

Barê me pir giran kirin, bi ser de li me siwar dibûn. Me nikarîbû em bêjin, ax em mirin gidî bes e. Ew hesp ji bezê di bin xudanê de mabû, rengê wê ji şilbûna hatibû guhertin. Em wê rojê pir betilîn. Betilbûn li dera han, bi ser de darê ku me dixwarin nayên hesêb. Zilaman ji xwe re av anîbûn, dema tî dibûn vedixwarin lê ê me ne av ne xwarin, bi tenê dema derfetek biçûk derdiket me hinek pûşê hişk dixwar lê bê fêde bû. Kesekî bi vî hale me nizanîbû, Xwedê zane dibe ku difikirîn canê me tune ye. Lê kesek bi derdê kesî nizane. Wê rojê êşa me ji me re ma. Hemû ji bo çend kurûş pere ku mirov qezenc bikin.

## Şewat

Roj çûye ava, dema êmê dewara ye. Du qantir, hevalê min Cimha çend çêlek û du ga em hemû di axokî mezin de ne. Axo pir fireh e. Ez û du qantir bi singa ve girê didan. Çimkî ger em vekirî bana dibe ku em têkevin ber dewara û êmê wan bixun. Êmê min û du qantira di cuheran de bi serê me vedikirin. Ê dewara jî di alifan de bûn, ê qismê gaya ji bo hîn bêhtir bi erk in car caran ew jî girê didan.

Wê şevê keça malê ji bedêla fanosê çira bi xwe re anîbû axo. çira danîbû ser refka ku di dîwar de çikilî bû. Keça malê dest bi dana êmê me kiribû, hinekan jî dest bi xwarina xwe yî kaya bi ceh kiribû; çawa bû em nizanin çira ji ser refikê ket erdê û dohnê gazê rijîya ket nav zibilê axo, pêre pêre agir bi ziblê kayî ket. Keça malê tu firsend nedît ku agir vemrîne. Lê bi dengekî bilind li bav û dîya xwe kir hawar û got, agir bi axo ket! Heya derket derve hundurê axo tije dixan bû. Dixan hivqasî tarî bû kesî hew kesî didît.

Xwedîyê me hat, herdu camê axo şikenandin ji bona dixan derkeve. Malbat û cîran hemû bi me ve bezîyan, bi satila av dikişandin ji bona agir vemrînin. Lê belê di vê navberê de du golikên hîn li ber şîrê dîya xwe, ji dixanê fetisîn. Berî agir bigehe min, min singê xwe hilkir û ez çûm ber pencerê ji bona bêhna min neçike, axirê di demeke kin de agir hat vemirandin, lê em hemû ji mirinê filitîn. Dema ez çûbûm ber pencereyê, ev lepta min bala xwedîyê min kışandibû. Ji xwe re digot, ev kera me sal bi sal bi aqil dibe xebera kesî jê tune.

# Kew

Kewekî cîranê me Ehmed hebû, li gora digotin Ehmed gelekî hez ji kewê xwe dikir. Her roj danê êvara jê re gevzik çêdikir û kewê xwe dixist nav wê axa nîv germî, kew xwe di nav wê axê de digevizand, gevzek gelekî bi kew xweş bû. Wekî din, ji nav teyarê dora mala xwe giya yê şîn ku nuh derketî ji kewê xwe re dida hev û hûr dikir û dida kewê xwe.

Ehmed gelek cara li ku ba qala kewê xwe dikir. Ji ber ku bi kewê xwe diçû nêçîrê, li ber dilê wî pir delal bû. Xwedê giravî kewê cîranê me ribat bû. Yekî mitirb jê re ji çîyayê Ebdulezîzê ê ba Şingalê anîbû. Çimkî kewê wî çîyayî gelekî bi nirx in. Gelek zilamên navdar dihatin ew kew dixwestin, lê cîranê me kewê xwe ne dida tu kesî.

Piştî demekê kesek nizane bê ji ku derê, nexweşîyek çuka hat ji vî kewî re, piştî çend hefta kewê cîranê me mir. Dinya li serê cîranê me xera bû. Gelekî li ber kewê xwe diket. Ehmed li nav teyara pişta mala xwe ji kewê xwe re tirbek kola û kewê xwe xist tirbê. Ez jî gelekî

bi vê buyerê xemgîn bûm, xwezî hemû mirov weke cîranê me Ehmed li ajala xwedî derketina û qedir bidana hemû zindîyan. Ji ber ku zindîyên di nav malan de kedî dibin fêrî malbatê dibin, xwe weke zindîyên yekî ji wê malê dibînin.

# Kund

Rojek ji rojê havînê yê germ, xwedîyê min ez bera nav garanê dabûm, wê rojê tu karê ku bi min bikin tunebû. Wê rojê pir kêfa min hat ji ber ku rojek ba jî min xwe azad didît. Ez ketibûm wê xeyalê bê ez ê roja xwe çawa xweş derbas bikim.

Gavan em biribûn nav zevîyekî ku nuh hatibû çinîn. Hîn li nav pirêzê simbilê genim û ceh li erdê mabûn. Me bi kêf û eşq dixwar. Tê zanîn ku kund bi roj dikevin nav şikêra xwe vedişêrin û demê êvara derdikevin nêçîra xwe dikin. Wê rojê gavanê me kundek di nav şikêra nav pirêzê de dîtibû, bi darê xwe nî gavantîyê lê dixebitî ku derxe lê kund ji tirsa re hîn behtir xwe bi nav şikêrê de dibir. Kund gelekî tirsîyabû, heya jê dihat diçû bi nav şikêre de û xwe vedişart.

Di wê derheqê de du leşker bi rîya xwe de dimeşîyan. Leşkera dît ku gavan li nav şikêrê dixebite. Rewşa gavan bala leşkera kişand û berê xwe dan gavên. Gavan pêşîyê xwest ber bi çîya de bazde lê hew fersenda wî hebû ku

bireve. Leşker gihanê bi zimanê Tirkî jê pirs kirin, bû nedir (ev çîye)? Gavan bersiv da û got, bû keklîkdir (ev kew e). Leşkera li qula nav şikêrê nerîn ku ne kew e, jê re gotin, ka vî kewî derxînin ev gavan bi darê xwe li kund dixîne lê kund dernakeve. Leşkera rahiştin darê gavên û di zikê gavên rakirin û gotin, divê tu vî kewî derxîne. Leşkera hinek asaq li gavan kirin, ew asaq di derheqê gavan de bû. Wê rojê ji bo me mezin bû. Em ajal hemû bi hev re me demek xweş derbas kir. Lê ez bi xwe ketim tirsa sibe ku bi min çi karê zor bikin.

# Zivingê

Rojekê midîrê nahîya Stilîlê hatibû gundê me, cem mala keya. Dixwest here gundê Zivingê. Gundê Zivingê nêzî gundê me ye, incex bi qasî seetekê dûr e. Mêrik kesekî weke gakî bû. Bi qasî 100 kîloyan giranya wî hebû. Nikarîbû bimeşê here. Keya ji xwedîyê min re got, ez dixwazim ku tu Kera Boz îro ji me re amade bike, em ê midîrê nehiyê pê bişînin gundê Zivingê. Xwedîyê min nikarîbû bêje na. Xortekî nûh gîhayî jî bi min re amade kirin, ji bona min vegerîne malê. Ez birim ber kevirekî mezin, midîr çû ser kevir heya li min siwar bû nivê ruhê min çû. Ji bo min gelekî giran bû. Ez di bin de ditevtihîm. Min ji xwe re got, ez ê zîtirkekê bavêjim ji bona ku ew midîr li ser erdê bigindire, dîsa min got wê bibe bela serê min.

Xortê nûhgihayî bi dû min de dimeşe û car caran dara li tengalê min dixîne, ji bona ez bimeşim. Ez hebekî xwe xurt dikim lê midîr nikare xwe li ser min bigre, ez ji lingê wî fam dikim ku dike bikeve, ez ditirsîyam

ku dest û lingê wî bişkê; dîsa min meşa xwe kêm dikir. Welhasil em gihan Zivingê, midîr ji ser pişta min daket.


Li binya gund golek avê hebû, min hinek av vexwar û îca xort li ser pişta min siwar bû û berê min da gundê me. Her car dara davêje min, ji bona ez baz bidim yanî bi çargavê herim, her çiqasî min nedixwest ez baz bidim lê lingê xwe li bin zikê min dixist, ez pir têşîyam. Min ji êşa xwe re bi lotikî baz da lê xort nikarîbû xwe li ser kurtan bigre, ji nişkave ji ser pişta min hat xwarê. Xwedê zane gelekî êşîya. Zorî da min û bi dara bi min ket, her darekî li serê min dixîne agir bi nava min dikeve. Dema hebekî bêhna wî fireh bû, ez birim ber kevirekî ji bo karibe careke din li min siwar bê. Heya em gihan gund ez di nav xwêdanê de mam.

Heger min karîba bi awayekî ji xwedîyê xwe re bigota bê vî xortî bi rê de çi anîye serê min, wê ew ceze kiribana. Lê belê em rebenê xwedê û hêsîrê mirovan karin çi bikin. Qey qedera me ev e. Xwedê em kerê reben ji bo kar û hesîrtîya mirovan dane dinê.

# Bêmalbûna min

Weke ku min di serî de gotibû, navê min Kera Boz e. Bavê min kerik şamî û boz bû, lê dîya min kerek adetî bû. Min berê gotibû, ez hîn dahşik bûm û xwedîyê dîya min ez bi çend şal ka firotibûm. Ez di nav kar û barê malê de mezin bûm. Her car pêwistîya min bi heskirinê hebû weke hemû ajalê nav malan, lê min ew heskirin qet nedît. Heya min çavê xwe girt û vekir dehşikbûna min qedîyabû, ez bibûm kerek boz î weke bavê xwe şamî û mezin. Nav û deng bi min ketibû. Karê kê derketa, digotin herin Kera Boz ji xwedîyê wê bixwazin. Kîjan karmendê dewletê bihata gund, ez dibirim ji bona li min siwarê û here bajêr, an navçeyê ya jî devereke din. Di hemû karê gundewarî de ez hatim bikaranîn.

Sal meh derbas bûn ez ber bi pîrbûnê ve diçûm. Rojek hat çogê min weke xanima min nema ez radigirtim. Êşek giran diket laşê min. Xwedîyê min nerî ku ez nema karim kara jî bikim, ji xwe re kerik adetî û hîn ciwantir peyda kirin û ji hewşa ku ez têde mezin bibûm û bi sala min têde kar kiribûn, bera min dan û ez mam di nava



gund de bê mal û bê xwedî. Min fam kir ku xwedîyê min, nema min dihewînin û nema dixwazin min xwedî bikin. Yanî ez mabûm li rasta.

Di demên biharê de ez karîbûm li ser bênderê dora gund biçêrim, lê di demê havînê de ji bo ku dinya gelekî germ bû, min nikarîbû li derve gelekî bimînim. Mêşê ku miseletî me kera dibin, her dem li dora min digerîyan, ew taqeta min nemabû ku ez karibim bi terîya xwe wan mêşê bêîman bifirînim. Ji bo min a gelekî zor demsala çele bû. Ajalê gundîya hemû di axurê wan de bûn, lê ê min ez di bin sincê dîwarê xanîyan de bûm, car caran ji serma ez diricifîm. Bi ser de zarokê gundîya dihatin pênç pênç li min swar dibûn û ji xwe re li nava gund digerîyan; ji bona ku ez xurt bimeşim bi dara bi min diketin, min gelekî êşek mezin didît. Û ev zarokê gundîya ne di wê bîrwerîyê de bûn ku bi vî awayî tahdê li min dikin. Kesek ji zilamê gundîyan bi wan zarokan re ne dixeyîdin û ne digotin çima hûn wilo li serê vê kera reben dikin.

Karê kê derketa, bi wî halê min karê xwe bi min dikirin û dîsa li min ne dibûn xwedî û bera min didan. Car caran ez diketim ji xwe re nav xiyala, ciwanbûna min weke şerîtekê di ber çavê min re derbas dibû. Ez pêre xemgîn dibûm. Dema ez dibirim daristanê ji bo barekî

çilo li min bikin, hivqasî barê min bi werqîlê fireh giran dikirin lê ne xema min bû, dema berê min diket bi alî mal de ji kêfa re min weke hespa meşek rahwanî dikir ê bidîta digot qey ev barê çilo ji xwe re diraqise. Lê çi fêde, roja îro ez ji taqeta xwe ketime. Ez nema weke car zemana têm bîra tu kesî. Wisa ketime halekî giran, min nema karîbû bala tu kesî bikşînim.

# Liberketina Şelaqo di derbarê mirina Kera Boz de

Kera Boz navê min kiribû Şelaqo, her çiqas me zêde li hev nedikir jî em kufletê malekê bûn, em bi hev re dijîyan, piştî ji mal berdanê çavê min lê digerîya, ez carna ber pê de diçûm; lê rojên wê yê bi eziyet û mirina wê ya bi ecêb ez jî xistim fikaran, gelo wê dawîya min çawa be.

Weke ku min di derbarê Kera Boz de dibihîst, Kera Boz dema hatibû dinyê cahşikek xweşik î gewr û boz bû. Lê belê li gora dihat gotin, dîya wê cehşikê kerik reşî qam qut û guh pahnî bû. Lê li gora xwedîyê wê nî pêşî gotibû, bavê wê kerik şamî û boz bû. Ez karim xweş bêjim ku, Kera Boz bi wan zarokê gund ê ku lê hatibû firotin bi hev re mezin bibû.

Bi rastî ew dehşik di nav salan de bibû weka qantirekê, xuyaye li bavê xwe hatibû. Karîbû rahje barê gelekî giran. Ji xeynî wê tu kerê wilo mezin û girs li gund tunebû. Kera Boz, kerek gelekî xurt bû, dema di kerwanîyê

de li pêşîya kera hemûya dimeşîya û berî wan digiha malê. Xwedî yê wê bi dû wê de baz dida. Çiqasî barê giran lê kiribana jî nedigot çima. Gundîyên ku ji kerê xwe diqeherîn digotin, axirê mala min ê tu jî ji me re weke kera mala xalê hecî ye, de bimeş bêxwedîyê.

Li alîyekî din jî, gundîya ji kerê reş û biçûk re digotin kera kurmancî lê ji bo wê digotin kera şamî, ev navê taybetmend ji kû derê hatibû kesî nizanîbû. Dibe ku bav û bapîrê wê ji alîyê Şamê hatibin. Havîna li ser bêndera ji bo gêrê, di rojên sermayê de yanî di mehê çele de dibirin êzingan, qurmê mezin li ser pişta wê dikirin. Wekî din, dema serbazin tirka an rêvebirê navdar dihatin gundê wan, ji xeynî wê li tu kerin din siwar nedibûn. Bi rastî ji her alî ve Kera Boz li derdora xwe, nav û deng dabû.

Salin dirêj û xedar di jiyana Kera Boz de derbas dibûn. Di wan salên buhurî de, dema kera mala xalê hecî di çax û benga xwe de, dema ku dimeşîya hemû der ji ber lingê wê dihejîyan, merov digot belkî erdhejandin çebûye. Lê bi demê re ew hêza wê qels dibû, roj bi roj ker dima bê taqet. Ew salên bêbawerî, bêhêvî, kera mala hecî ji dema xwe yê serwer bi dur xistibû. Ew meşa bi lotikanî çû û ma meşik bi hêdî û bê bi zorî. Dema berê ji kerê re nedigotin ço ker ji ber xwe ve dimeşîya, lê neha

ço û hey ço. Ma meşik bi qehr û lêxistin û ji xeynî sixêfê pîs jî pê re.

Roj hat ku kera mala heci nema karibe karekî bike û nema karîbû di bin wan barê giran de bimeşe. Ji bo wilo mala hecî kerik din ji xwe re peyda kirin. Ev Kera Boz berdan çola. Wek mirov ji hev re bêjin me tu nema divê û tu nema kera me yî.

Piştî Kera Boz hat terikandin, dîsa jî Kera Boz li dor mala heci diçû û dihat; ji bo ku dilşewat bû, çimkî di wan salên dirêj de her çiqasî karê pir zor û giran kiribûn jî, heman demê di hewşa mala hecî de av vexwaribû û xwarin xwaribû. Çimkî cîhekî din ku herê tunebû. Yanî ji alîyê din ve ew ker bû û serê wê jî nedişixulî. Nema zanîbû bi kû de here. Karê wê yî ku hebû, mabû di bin destê zarokên gundîyan de, lê siwar dibûn û li dora gund digerandin. Pir tahde lê dikirin. Zilamê gund bi zarokan re dixeyidîn, digotin, çima hûn li wê kerê wilo dikin, ma ne guneh e. Zarokan digotin, xalo xwedîyê wê wêna berdaye, kesek nema li ser dixeyide.

Sal û roj bi zikikî têr û yekî birçi derbas dibûn. Ji bo xwe têr bike, diket ser bêndera yên ku di nav teyarê gundîyan de bûn. Kesin gundî kevirin mezin li termalê wê dixistin û berdidanê ji nav teyarê xwe. Ji xwe birînê wê nî kevn ên dewsa kurtanê wê hîn rehet nebibûn. Ji

bo wilo her roj ji wana xwîna sor dihatin. Zarokê gundîyan, ev kera pîr û kal bi dehfa xistin çaleke kûr a ku ji bo genim kolandibûn. Bi rojan ev ker ma di hundurê çalê de. Ji birçîbûna nema karîbû jiyana xwe bidomîne. Ewqas kul û keder û xemê xwe li ber serê xwe danî û çavê xwe li dinyayê girtin. Lê ez xweş dizanim ku Kera Boz berî çavê xwe bigre, çavê xwe li derdora xwe gerand lê çi fêde keseki ji malbata mala xwedîyê xwe li dora xwe nedît. Piştî Kera Boz mir çend hêsirin girover ji çavê wê hatin xwarê. Heya wê rojê min nizanîbû ku ker jî digirîn.

www.wesanxaneyaazad.net